



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 11

Çîroka Tofanê û çiyayên Kurdistanê (Hin agahdariyên giştî)

Netewe û çand:

Dagîrkeran hên ji demên kevin da du şêwazên têkberinê li dijî gelan pêkanîne:

- Têkberina fîzyologî: Bi kuştin, xizankirin, awarekirin, nixumandin û tevlêkirinê
- Têkberina çandî: Bi têkberina çanda gelan, bidûrxistin ji çanda wan û reşkirina wê.

Bidûrxistina neteweyê ji çanda wê kiryareka pir tirsnak û xeternake. Ew tê maneya şelandina neteweyê ji giyanê wê, ji rahên wê yên resen û petî û ji nirx û sinciyên wê. Yanê guhartina wê ku ew tenha bibe dirûv û teşeyeka vala, ji bo yên din bibe dûvik û kole. Li ser asta çandî, dagîrkeran çar şêwaz pêkanîne ku çanda kurdî tineyî bikin:

- 1 - Têkberina beşekî ji çanda kurdî bi behaneya ku ew çandeka rêwendakirinê û nebawermendiyê ye (kufir).
- 2 - Çepelkirina beşekî ji çanda kurdî, daku Kurd bixwe û kesên din jê birevin, jê şerm bikin û xwe jê bi dûrbixin.
- 3 - Wendakirina beşekî ji çanda kurdî, daku kesê Kurd bê rah û damar bimîne.
- 4 - Talankirina beşekî ji çanda kurdî ku ew ne ya Kurdane; ew ya kesên dine.

Û ji encamên van siyasetên kolonyalîst û dirinde ew bû, ku Kurd gihîştin sedsala bîstan û ew ji çanda xwe ya resen tiştêkî nizanin; ji bilî hin tiştên biçûk. Û ji encamên van siyasetan dîsa ew bû ku her carê Kurdan derbarê beşekî biçûk jî xeber bida, pisporên çandên dagîrkeran seferber dibûn û angaşt dikirin ku Kurd dîrokê zir û çewt dikin (tezwîr dikin) û tiştê ku ne yê wane angaşt (îddîa) dikin. Wek ku Kurd - tevî hejmara wan ya bilind - gelekî bê welat, bê dîrok û bê çand be.

Tofan di bermaya cîhanî da:

Em di vê lêkolînê da mijarekê digirin dest ku li ser asta cîhanê balavbûyî ye û pir tê naskirin. Lê pir kêr tê zanîn ku peywendiya wê bi welatê Kurdan (Kurdistan) ra heye. Mebesta me mijara *Tofanê* ye (*Tofana Nûh*).

Belê, bûyera *Tofanê* bûyereka cîhanî ye. *Dr. Muhemmed Beyyûmî Mihran* dibêje:

"Bi temamî li gor lêkolîna *James Frazer* çîrokên *Tofanê* li parzemînên Asiya, Australiya, Amerîka Bakur, Navîn û Başûr, hên pêş heyama ewropî belav bûne. Lê belê belavbûna wê li parzemîna Ewropa kêr û li Afrîkayê jî hên kêmtire, ... di çanda misirî kevnar da ti şopeka vê çîrokê nîne"¹.

Ji tofanan ra, helbet rahên rastîn di dîroka mirovatîyê da hene, û peywendiya wan bi heyamên geologî qeşayî ra heye. Ya dawîn, heyama qeşayî çarem bû ku pêş 20000 (bîsthezâr) sal bi dawî bû². Li dawîya her heyameka qeşayî û bi encama bilindbûna radeyên germahîyê, berf û qeşaya ku kombûye diheliya û vedigeriya dibû tofanên pir gewre. Ji bilî wê, tofan di mîtologî û ayînan da jî hatiye gotin. Nivîsên mîtologî yên here kevin ku agahdariyan derbarê tofanê didin, nivîsên somerî ne.

Emê li vir, li ser kok û binyata *Somerîyan* û mîtologiya somerî pir ranewestî, ji ber ku ev mijareka pîrşax û firehe. Tiştê girîng ewe ku pîraniya lêkolînerên li dîroka *Somerîyan* piştrast dikin ku ew ji çiyayên başûrê Kurdistanê (beşê dagîrkirî li Îraqê) daketine deştên başûrê Mêzopotamiya³ û li wir şaristaniyeka geş û here kevin li rojavayê Asiyayê pêkanîne û di warê mîtologî da jî ya here dewlemende. Vê şaristaniyê bandora xwe li hemû şaristaniyên rojavayê Asiyayê kiriye û beşek ji mîtologiya somerî ketiye nav ayînen asîmanî (*Cihûtî, Krîstîyanî û Îslametî*), bi taybetî jî çîroka afirandina gerdûnê û heyberan, û çîroka *Tofanê*.

Ka em niha hin agahdariyên giştî derbarê çîroka *Tofanê* ya somerî bînin ziman.

Hin agahdariyên gelemper:

Şêwazê somerî ji navê *Tofanê* ra eve: "uru-ma-a" û şêwazê babilî: "abubu"⁴ ye. Bi gelemperî, derbarê navên somerî, divêt em zanibin ku ew ji aliyê bilêvkirinê da raserî pir guhartinan hatine, dema ji somerî derbasî akkadî, paşê babilî bûne, û di pey ra derbasî zimanên ewropayî di dema nûjen da bûne. Û cara dawî derbasî wergerên erebî bûne.

Dîroka somerî - bi gelemperî - bi du heyamên sereke tê levakirin:

- Heyama pêş *Tofanê*: Di vê heyamê da padîşahî cara yekem ji asîman da dadikeve ser bajarê "*Erîdû*" û paşê derbasî pênc bajaran dibe heya ku *Tofan* tê.
- Heyama piştî *Tofanê*: Di vê heyamê da, padîşahî ji asîman da dadikeve ser bajarê "*Kîş*" (*Kish*) û senseleta *Kîş* ya padîşahî yekem, senseleta yekeme ku piştî

Tofanê di destpêka hezarsala sêhem b.z. da serdarî kiriye. Nawenda wan bajarê "Kîş" bû li nêziya bajarê *Babil*. Hejmarek ji padîşahên wê lexema "*Padîşahê Kîş*" li xwe kirine. Di pey ra, senseleta bajarê "*Ûrûk*" padîşahiya yekem bû ku bi saya serdar û qehremanê xwe "*Gilgamêş*"⁵ bajarê "Kîş" stand û xiste bin desthilata xwe.

Divêt em bêjin ku serdarî li welatê Somer ne padîşahiyeke nawendî bû, û seranserê welatê Somer ne di bin desthilata yek padîşahî da bû. Ew di navbera "dewlet - bajar"-an da beşkirî bû; wek çawa li welatê Yûnana kevin jî.

Ji çîroka *Tofanê* ra pir gotûbêj hene. Ya here kevin gotûbêja somerî ye. Di pey ra gotûbêja babilî ye ku di bingehe da ji gotûbêja somerî wergirtine. Cudahiya here girîng û yekane di herdu gotûbêjan da li ser navê qehremanê *Tofanê* ye. Di gotûbêja somerî da navê qehreman "*Ziusudra*" ye û di ya babilî da "*Utnapishtim*"⁶.

Qehremanê *Tofanê* "*Ziusudra*" (*Utnapishtim*) kurê "*Webar-Tûtû*" ye û ew babîrê qehreman *Gilgamêşe*. Ji ber keda wî ya mezin di çêkirina keştiyê da û xelaskirina cinsê mirovî ji têkçûna bi *Tofanê*, xwedayan bi dilovaniya xwe jiyana hemdem dane wî, û bilindkirine heya redeya asîmanî; ewe yê ku sir û raza mayîna mirov wek hemdem para wî ye⁷.

Wek çîroka afirandina gerdûnê û heyberan, û çîroka *Tofanê* kesayetiya "*Ziusudra*" ya somerî hate guhartin û bû ramaneka ayînî bingehe ku derbasî hemû çandên rojavayê Asiyayê bû. Ev tişt, di *Cihûtî* û *Îslametiye* da, di kesayetiya pêximber *Xizir*, mirovê hemdem da, tê xuyakirin, yê ku xweda şiyan daye wî, bi pir dirûvên cuda bê xuyakirin, û di rewşên dijwar da alîkariya tenikhalan û zorlêkiriyan bike⁸. Ev kesayetî di *Krîstiyaniye* da, di kesayetiya "*Mar Circis*" (*Cercîs*) da tê xuyakirin. Ev jî careka din girîngiya bermaya mîtolojiya somerî ji bo têgihîştina bermaya çandî ya seranserê rojavayê Asiyayê piştrast dike; û ji bo têgihîştina pêkhatiyên hersê ayînan (*Cihûtî*, *Krîstiyaniye* û *Îslametiye*).

Wisa tê xuyakirin ku mijara "*Ziusudra*" (mirovê hemdem) di ayîna kurdî kevnar "*Yezdaniye*" da jî hebû. Nîşana vê yekê ewe ku pêximber *Xizir* di bermaya beşên ayînî, yê ku ji *Yezdaniye* veqetiyane da jî heye; wek "*Êzdîtî*", "*Kakayîtî*", "*Alawîtî*" (*Elewîtî*). Ji *Xizir* ra ziyaret li pir herêmên Kurdistanê hene. Ew bi wê yekê navdare ku ew li nêziya gol û kaniyên avê dimîne û cejnêka wî jî di biharê da heye.

Dema qehreman *Enkîdû*, dostê *Gilgamêş* yê pir jê nêzîk û pêra germ, mir û *Gilgamêş* ji mirinê pir tirsîya, biryar da ku here ba bapîrê xwe "*Ziusudra*"

(*Utnapishtim*) yê ku piştî *Tofanê* hên hemdem mabû, daku raz û sira hemdemiye nasbike. Û li wir "*Ziusudra*" çîroka *Tofanê* ji neviyê xwe ra got.

Evê mijara me ya dahatî be.

Çarşemb, 10.06.2015

Jêder:

¹ Muhammed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 56-57.

² Georg Ro: Îraqa kevin, rûpel 67.

³ Muhammed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 89-92. Amer Suleiman, Ehmed Malik El-Fityan: Hin semînar di dîroka kevin da, rûpel 75. Hesen Muhyeddin El-Sehdi: Di dîroka rojhilata nêzîk ya kevin da, rûpel 52.

⁴ Fadil Ebdulwahid Ali: Tofan di jêderên asîmanî da, rûpel 17.

⁵ Georg Ro: Îraqa kevin, rûpel 55-56.

⁶ Muhammed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 58.

⁷ Muhammed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 70.

⁸ Li El Tabarî binêre: Dîroka El-Tabari, 1/365, 2/28.